# CIVAKA KUJER A QESTÎK

## Û ŞOPÎNERÊ MİRATE YA:

ÇANDA BAVIKSALARÎ



Têgeha Kujerê Qestîk, têgeheke nû ye ku Rêber Apo di nivîsên xwe yên dawî de aniye rojeva me. Di zimanê Kurdî de wateya têgeha Qestîk, bi şêweyê “qestîka kir; ango bi mebest û bi zanebûn kir” tê ravekirin.

Komalên Jinên Kurdistan

# Di zimanê Tirkî de jî bi şêweya qestê can û malê mirovan kirin; ango bi zanebûn kuştin û talankirinê tê ravekirin.

**Her çiqas ev têgeh bi awayeke sereser bê gotin û derbaskirin jî Rêber Apo eşkere dike ku ev têgeha kujerê qestîk ne têgeheke ewqas normal e û ji dîrokê û heta niha çavkaniya bingehîn a hemû hilweşîn û pirsgirêkên jiyanî û pergalî ye. Helbet ev yek ji mijarên sereke ye ku divê demên pêş gelek bê nîqaşkirin bi awayeke herî baş bê analîzkirin. Ya ku em ê li vê derê bikin, tenê bi kurtebêjiyek balê kişandina ser mijarê ye.**

## Refleksa xwe parastinê ya ku bi çêbûna zindiyên destpêkê re pêş dikeve, nêzîkatiyeke xwezayî ye.

**Nêzîkatiya têkoşîna jiyanê ya klan û qebîleyên seretayî, di çarçoveya mêjiyê hisî de parastina canê xwe, dabînkirina pêdiviyên jiyanî yên weke xwarin, vexwarin, xwe bi cihkirin û zêdekirina hebûna xwe de ye.**

Komalên Jinên Kurdistan

# LÊ BELÊ EW BI TUNDIYEKE TUNEKIRINÊ TEVNAGERIN; HEWL DIDIN DI NAVA AHENGA XWEZAYÊ DE HEBÛNA XWE BIDOMÎNIN

**Di salên 10.000'an ên B.Z.'ê de mirovahiyê bi Şoreşa Neolotîk a bi pêşengiya jinê re dest bi jiyana xwecihî kir. Ji ber xisleta jinê ya zayînê li derdora wê klanên ku ji zarok, xal û xaltîkan pêk dihatin ava bûn.**

**Jinê, di klanê de ji têrkirin, xwedîkirin û ji her cure xeteriyê parastina zarokan xwe berpirsiyar dît. Bi vî rengî gundên ku bi berhevkirina pincarê û çandiniyê debara xwe dikirin ava bûn.**



**CÎHANA ME SERDEMA XWE YA HERÎ XWEŞ A DESTPÊKA JIYANA KOMÎNAL, BI ŞOREŞA NEOLOTÎK A JINA DAYÎK RE PÊK ANÎ**

## Qlûbeya kujerê qestîk

a zilamê nêçîrvan ku bi demê re di nêçîrkirina lawiran de pispor bûbû, çav berdide jiyana komînal a li derdora jinê kombûye. Dibîne ku jin zarok tîne, xwedî dike, mezin dike, diparêze, li gorî demsalan avahî lêdike, di warê berhevkirina pincar û çandiniyê de pêş dikeve û civakek dayîksalar ava dike. Kujerê qestîkê ji qlûbeya nêçîrvan, li hemberê jiyana komînal a di pêşengiya jinê de pêk hatiye dikeve nava hesûdiyan û bi rêbaza tundrew û kujer a ku tekane qabiliyeta wî ye, êrîşê civaka jinê dike. Nexasim bi çekên xwe yên ku ji kevirê obsîdyenê çêkiriye, her kesê ku derdikeve pêşberê wî dukuje. Tirs û xofa kujeriya xwe nîşan dide û bi xesp, bi talan û bi tund û tûjiyê dest datîne ser berhem û jiyana civaka jinê. Di dîroka mirovahiyê de bingehê tevahiya xerabiyên weke rûxandin, talan, wêranî, xesp, tecawiz, koledarî, zilma li ser mirov û xwezayê bi vî rengî tê avêtin.

Komalên Jinên Kurdistan



Helbet jin hema yekser berhemên xwe radestê zilamê kujerê qestîk nake.



Çanda dayîka xwdavend bandora xwe bi hezaran sal didomîne.



Li gel berdêlên giran û pevçûnên dijwar jî di kesayeta jinê de yekemîn şikestina zayendî pêk tê. Serkeftina kujerê qestîk ne tenê ji ber qabiliyeta wî ya kuştinê ye; ji ber pêşxistin û baş bi kar anîna wî ya amûrên kuştinê ye jî.

Jina dayîk çiqas aqil û hêza xwe ji bo jiyana civaka komînal bi kar anî be, zilamê kujerê qestîk jî aqil û hêza xwe ya fîzîkî bi milyonan qat zêdetir ji bo pêşxistina amûrên kuştinê, ji bo dabînkirina rêbazên kolekirinê û ji bo pêk anîna dizî û talanê bi kar aniye.






Ango ger pêwîst be mirov rastiya kujerê qestîk bibêje; ev zilam her bi madeyên weke sifir, tunç û hesin hilberîna çekên kujer kiriye û bûye pisporê vî karî. Ferq û cewaziya di navberê de ev e: Jin bi van madeyan amûrên çandiniyê bi pêş dixe û ji bo tov çandinê erdê cot dike; zilam jî van madeyan ji bo zêdetir kuştin û kolekirina mirovan bi kar tîne. Ji ber ku dîrok jî bi destê van kujerên qestîk hatiye nivîsandin, di dîroka nivîskî de zêde qala jinê û berhemê jinê nayêkirin. Lê belê lêkolînên arkeolojîk eşekere dikin ku bi hezaran sal di pêşengiya jinê de jiyaneke komînal a bi çanda xwedavendiyê pêk hatiye û bermahiyên vê jiyanê di roja îro de jî li ser xaka Mezopotamyayê zindî ne.

# *Di navbera salên 4000-3500'ên B.Z. de kujerê qestîk bi pêşketina bajar û dewletbûnê re sîstema xwe gihande asta fermiyetê*

Kujerê qestîk xwe weke nûnerê xwedê û xwedayê qral îlan kir û di serî de jinan, tevahiya civakê ji bo xizmeta xwe weke kole bi kar anî.



Destpêkê bi darê zorê vê yekê ferz kir, piştre jî di bin navê xizmetkariya xwedê de serdestiya xwe da qebûlkirin. Baş e, ev xwedayê qral kî bû ku rahibên zilam dibûn nûnerên kordînekirina zilm û xirabiyên wî. Her çiqas di kûrahiya dîrokê de mabin jî gelek dişibin kujerên qestîk ên dîktator ku di roja îro de ji bo serdestiya xwe baweriyên olî bi kar tînin. Di roja îro de jî dema em li kela, sûr û dêrên ku bi destê koleyan hatine çêkirin dinêrin, em bawer nakin ku ev avahî bi hêza fîzîkî ya mirovî hatibin çêkirin.





Ji ber ku tevî teknolojiya heyî jî mirovên roja îro nikarin avahiyên wiha xweş û saxlem ava bikin. Xala ku divê em bala xwe bidinê ne tenê xweşikbûna van avahiyên dîrokî ye; pêhisîna bi êş û azarên wan mirovên kole ye ku kujerên qestîk çawa ji bo bercewendiyên xwe bi îşkence û zilmeke giran hêza wan a laş bi kar anîne. Kî dizane çend hezar mirov di demên kişandina wan kevirên qirase de di bin kevir de pelçiqîn, mirin, seqet bûn û kujerên qestîk jî li ser zîguratên xwe bi zewq li wan temaşe kirin. Ji bilî vê ji ber zêdebûna koleyan a hejmarî û bi saya hilberîna berhemên koleyan, kujerên qestîk di mijarên weke matematîk û nivîsê de jî bi pêş ketin.

Bi vî rengî dîroka kesên ku dîrok ava kiribûn nehate nivîsandin; kujerên qestîk dîroka xwe ya kuştin, talankirin, xesp û dagirkeriyê xemilandin û weke serkeftineke mezin bi tevahiya mirovahiyê dan qebûlkirin.


Komalên
Jinên
Kurdistan



Bi vî rengî dîroka kesên ku dîrok ava kiribûn nehate nivîsandin; kujerên qestîk dîroka xwe ya kuştin, talankirin, xesp û dagirkeriyê xemilandin û weke serkeftineke mezin bi tevahiya mirovahiyê dan qebûlkirin. Ji wê rojê şûnve navê dagirkeriyê bû fetih, navê xespê bû xenîmeya şer, navê kuştin û talanê jî bû serkeftina qral û fermandarên leheng. Tê gotin ku Qral Sargon bi serê mirovan kela û sûr daye avakirin. Li beramberê vê hovîtiyê jî ti kes pêwîstiya empatîkirinê nabîne û nabêje çima?


Komalên Jinên Kurdistan





Her ku ev kiryar normalîze bûn, kujerên ku dan ser şopa kujerê qestîk jî bê navber hebûna xwe domandin. Bi pêşketina her serdemeke baviksalarî re jî kujeriya xwe derxistin asteke jortirîn û vê kujeriyê fermî kirin. Saziya kujeriyê ya bi qlûbeya nêçîrvanan dest pê kiribû bi pêşketina dewletê re xwe gihand yasayên fermî û di bin navê şaristaniyê de rawabûna kujeriya xwe ya qestîk bi dest xistin. Şerên Serdema Navîn her çiqas di bin navê şerê olî de hatibin meşandin jî ev şer di bingeh de şerê desthilatdariyê bûn ku di navbera zilamên kujerê qestîk de qewimî bûn. Naxwe baweriya ti kesî nabe hinceta şer û tund û tujiyê.

Lê belê mixabin di pêvajoyên bi vî rengî de zirara herî mezin her tim digihîje jinan. Hişmendiya kujerê qestîk, jinê ji asta xwedavendiyê daxist asta cariyetiyê, ji haremê daxist koletiya malê ya bê heqdest. Lê belê kujerê qestîk bi vê yekê jî nesekinî û di SS. 15. û 18. de jinên hekîm ên ku bi gîhayan nexweşiyan derman dikirin, bi navê hevkarên şeytan tewanbar kir û nêçîra cadûyan da destpêkirin. Ev nêçîrên cadûyan nêzî 300 salan didome û bi qasî tê zanîn di van salan de 100 hezar jin tên qetilkirin. Hêdî hêdî ber bi serdema modern a medeniyên ne medenî ve, êdî kujerê qestîk ê qlûbeya nêçîrvan weke leşker, polês û dîktatorê siyasî yên dewletê bi cil û bergên pîr û pak in, bi çekên modern û hîn kujer kemilandî ne û împaratoriya wan a tirsê bi parastineke xurt hatiye fermîkirin.


TÊ GOTIN KU DI 1. ŞERÊ CÎHANÊ DE LI GEL WENDAHIYÊN LEŞKER Û SIVÎL, 37 MILYON MIROV HATINE KUŞTIN.

# DI 2. ŞERÊ CÎHANÊ DE JÎ



*tê texmînkirin ku*

**70-85 MILYON MIROV HATINE KUŞTIN.**



Ji aliyê çavkaniyan ve hatiye tespîdkirin ku di encama bombeya atomê ya li Hîroşîmayê hate teqandin de hejmara mirî û wendahiyan gihîştiye 140.000’an. Di heman salê de li ser Nagazakiyê jî bombeyên kîmyewî tên barandin û tê gotin ku li vê derê jî 200.000 mirov jiyana xwe ji dest didin. Kî van komkujiyan pêk tîne? Va ye ew dewletên ku qaşo mezin in! Ango kujerên qestîk ên nûjen in. Birîtanya bi korsaniya rêyên deryayî mal û milkê mirovên niştecihî wêran kir û di encamê diziyên mezin de împaratoriya mezin a Birîtanyayê ava kir.



**EMERÎKA DI ENCAMA DESTESERKIRINA MAL, MILK Û ZÊRÊN QEBÎLEYÊN NIŞTECIHÎ DE Û BI BINDESTKIRINA REŞIKÊN KU WELATIYÊN XWERÛ NE HATE AVAKIRIN.**



**TEVAHIYA DEWLETÊN SERDEST HERTIM HEWL DANE LI SER CIVAKÊN KU NE XWEDÎ ÇEK Û ARTÊŞ IN MÊTÎNGERIYÊ FERZ BIKIN Û YÊN LI DIJBERÊ WAN DERKETINE JÎ TUNE BIKIN.**

# *Tenê em ji civaka Kurd mînakek bidin:*

Dema ku Tirk ji Asya Navîn li ser pişta hespan hatin Rojhilata Navîn, gelê Kurd yek ji gelê herî qedîm ê Mezopotamyayê bû. Gelê ku yekem car ji Tirkan re deriyê Kurdistan û Anatolyayê vekirin û wan weke mêvan pêşwazî kirin, gelê Kurd bû. Ji ber ku Kurd paqij û mêvanperwer bûn, mêvanê xwe kirin taca serê xwe. Tirkan jî piştgiriya Kurdan bi kar anîn, li ser tevahiya xaka welat bi cih bûn û dewleta xwe avakirin.




**PIŞTÎ KU KARÊ XWE BI KURDAN QEDANDIN JÎ DESTPÊKÊ KURDAN QETIL KIRIN.**

Tenê li Newala Zîlanê 40.000, li Dersimê jî 30.000 Kurdan wekî ku avekî vexwin qetil kirin. Kurdistanê kirin çar perçe û xwişk û birayan ji hev qut kirin. Di 50 salên dawiyê de ji 40.000'î zêdetir Kurdên ku daxwaziya mafên xwe dikirin bi rêbazên cihêreng ên kujerê qestîk hatin qetilkirin, zêdetirê 30.000 gund hatin şewitandin û gelê li ser xaka xwe neçarê koçberiyê kir. Kurdên ku parastina mafên xwe dikirin jî weke terorîst bi nav kir û wisa ji cîhanê re îlan kir.

# *Ji ber ku kujeriya wan a qestîk li ser navê dewleta fermî bû cîhanê jî ji wan bawer kir.*



DIVÊ MIROV JI CÎHANÊ VÊ PIRSÊ BIKE: GELO WEKE KUJERÊ QESTÎK DEWLETA TIRK A KU KOMKUJIYAN DIKE, GUNDAN DIŞEWITÎNE, ZAROKÊN DI ZIKÊ DAYÎKÊ DE JÎ BI SUNGIYA DERDIXÎNE Û DIKUJE, ÎŞKENCEYAN PÊK TÎNE, TECAWIZÊ JINAN DIKE, KURDAN PENABER DIKE Û LI SER XAKA WAN GUHERTINA DEMOGRAFIK PÊK TÎNE Û ZIMANÊ WAN QEDEXE DIKE TERORÎST E? AN KURDÊN KU XWEDIYÊN VÊ XAKÊ NE Û DIXWAZIN LI SER XAKA XWE BI ÇAND Û ZIMANÊ XWE BI AWAYEKE AZAD BIJÎN TERORÎST IN? BÊGUMAN NE PÊKAN E KU MIROV TEVAHIYA KIRYARÊN XIRAB ÊN KUJERÊ QESTÎK Ê SÎSTEMA BAVIKSALAR LI VÊ DERÊ BI CIH BIKE. JI BER KU BI TEVAHÎ BERHEVKIRIN Û RÊZKIRINA KIRYARÊN XERAB ÊN VÊ SÎSTEMÊ DI WÊ ASTÊ DE NE KU LI BERAMBERÊ VAN KIRYARAN ZEKAYA ÇÊKIRÎ JÎ DICEMIDE Û NAXEBITE. LÊ BELÊ VEGOTINA HINEK RASTIYAN Û TÊKOŞÎNA LI DIJBERÊ VÊ SÎSTEMÊ JÎ BERPIRSIYARIYEKE WIJDANÎ Û EXLAQÎ YE.



Di salên dawî de hêzên hegemonîk çeteyên bi navê DAIŞ'ê yên ku li dijî tevahiya nirxên jiyanê ne kirin bela serê mirovahiyê. Van keriyên hov ên çeteyan li cihanê, li Rojhilata Navîn, nexasim jî li Kurdistanê kiryar û qetliyamên ji paşverûtiya Serdema Navîn wêdetir raber kirin.





Ev kujerên qestîk ên ku naşibin ti tiştekî, bi hezaran mirovên bêguneh li ber kamerayan serjêkirin û bi armanca ku di nava civakê de tirs û xofê ava bikin, dîmenên tewanên xwe weşandin. Armanca wan ji vê taktîkê ew bû ku mirov her tiştê xwe ji wan re bihêlin û birevin û bi hêsanî radestê wan bibin. Ev çeteyên ku di warê ruh û mêjî de nexweşin, bi hezaran jinên Êzîdî weke xenîmeya şer revandin û li sûkan wekî koleyan firotin. Her wiha gelek jinên ji netewên dîtir jî bi heman şêwazî firotin.

# *Qet ne ecêb e ku hinek ji van sûkên koleyan jî li Tirkiyê bûn.*

**LÊ BELÊ BERTEKÊN HEYÎ JI PARVEKIRINÊN MEDYA CIVAKÎ WÊDETIR NEÇÛN. HETA KU LI DIJÎ VAN ÇETEYAN QEDRÊ ŞERÊ CIWANÊN KURD, NEXASIM JÎ QEDRÊ ŞERÊ JINÊN KURD HATE ZANÎN. ANGO ZILAMÊ KUJERÊ QESTÎK Ê KU DI DÎROKÊ DE HERÎ KIRÊT Û HERÎ HOV E, BI DESTÊ JINÊN KURD ÊN KU JI BO NIVÎSANDINA DÎROKA AZADIYA JINAN SOND XWARINE; BI DESTÊ WAN JINÊN HERÎ ADIL, HERÎ KOMÎNAL, HERÎ ÎNSANÎ Û HERÎ BEDEW BER BI DOJEHÊ VE HATIN QEWITANDIN. CÎHANÊ BI TEVAHÎ DÎT KU HETA MIROVÊN KU RÛMETA MIROVAHIYÊ DIPARÊZIN HEBIN, WÊ KUJERÊN QESTÎK BI RIHETÎ NEJÎN.**





Xaleke dîtir a herî girîng jî di lîstoka xanîkan a kujerê qestîk de împaratoriya biçûk a bav, bira û mêr e. Ev kujer, di nava malê de bi awayê bavik dewletê tevdigerin. Ev zilamê ku qaşo bi navê hezkirinê û bi evîneke mezin bi jinê re zewiciye, dema ku ev jin carekî daxwaziya wî pêk neyne dikare bi hêrseke mezin û pir rihet wê bikuje. Ango ew zilamê li dijî kesên bi ser xwe de nikare tiştekî bike, hejar û belengaz e, di malê de dibe kujereke qestîk ê dirinde û jinê qetil dike. Li cîhanê di serê her 10 xulekan de jinek ji aliyê mirovên xwe ve tê qetilkirin. Hema tenê di sala 2023'yan de 51.000 jin hatine qetilkirin û mixabin ev hejmar her roj zêde dibe. Dewlet jî qetilkirina jinan weke rêzefîlman û nûçeyên magazînê dide pêş û ji bo teşwîqkirina kujeran her tiştî dike.

**JIN NEÇARE KU HEM LI DIJÎ KUJERÊ BIÇÛK Ê LI MALÊ HEM JÎ LI DIJÎ MEZINTIRÎN KUJERÊ QESTÎK Ê LI DERVE TÊKOŞÎNEKE GERDÛNÎ BIDE MEŞANDIN. NAXWE PÊŞIYA FELAKETÊN MEZINTIR JÎ NAYÊ GIRTIN.**

## KUJERÊ KASTÎK NE TENÊ LI SER MIROVAN RÛXANDIN Û MÊTÎNGERIYÊ PÊK ANIYE;



niha sîstema ekolojik jî ji ber kiryarên kujerê kastîk dinale. Her ku dem derbas dibe di cîhana me de av kêm dibe, erdhej çêdibin, daristan dişewitin, tên şewitandin, germahî zêde dibe, êdî rûyê erdê bi gemara plastîk, bi gazên bi zirar, bi hewaya qirêj tije bûye û derfeta jiyanê nema ye.



## KAPÎTALÎZM HEWL DIDE CIVAKEK AVA BIKE KU MIROVÊN WÊ DI MÊJÎ DE BÊN TEVIZANDIN, HER LI PEY BERCEWENDIYÊN ROJANE BIBEZIN, QET TÊR NEBIN, GIRÎNGÎ NEDIN TI NIRXÊN EXLAQÎ Û TENÊ TIŞTÊN HEYÎ XERC BIKIN.





Di rêjeyekî de vê armanca xwe jî pêk aniye. Êdî mirov li siberojên zarokên xwe nafikirin. Her kes rojane dijî û ti kes ji bo çandinî û ekolojiyê naxebite. Her kes ji bo teknolojî û robotan dixebite. Lê belê sebr û sebata ekolojiya xwezayê jî heta cihekî ye.

Komalên Jinên Kurdistan

# Dema ku xwezaya dayîk tola xwe ji vê civaka kujerê qestîk bigire, wê robot nikaribin wan ji vê xezebê rizgar bikin.


Êdî pêwîste hem kujerê qestîk hem jî mirov bi tevahî vê rastiyê fêm bikin ku ger xweza têk biçe wê cîhana me bi hemû zindiyan re têk biçe.



**DIVÊ ÊDÎ HER KES BIZANIBE KU EM DI HEMAN KEŞTIYÊ DE NE; AN EM Ê BI HEV RE VÊ KEŞTIYÊ JI FELAKETÊ RIZGAR BIKIN, AN JÎ EM Ê VÊ RASTIYÊ JI NEDÎTÎ VE BÊN Û BI KEŞTIYA XWE RE NOQÊ AVÊ BIBIN.**

**WÊ DEMÊ JÎ NE TEKNOLOJÎ, NE PERE, NE MAL, NE MALBAT, NE JÎ BI HÊZBÛN WÊ NIKARIBE JI KEŞTIYÊ KESEKÎ SAX RIZGAR BIKE.**

Komalên
Jinên
Kurdistan



*Abdullah Ocalan bi têgeha 'kujerê kastik' datîne holê ku ev cînayet berhemên zîhniyeteke binyatî , dîrokî û kolektîf in.*

www.kjkonline.net